

Bi serbilindî, Te rêz û hezkirina gelê xwe wergirt

Bavê Helebçe

Di nava rojên cihanê de, gelek rojên giranbuha û girîng hene, di wan de, şahî û xemgînî tevî hev dibin û dikevin dîroka gelan.

Roja 18-10-2010 an jî, di dîroka gelê Kurd li Sûryê de rojêke taybet e. Di vê rojê de, keskesor di bejn û bala lehengê nemir, payebilindê bi rûmet SIMAYIL EMO de der bû.

Sûriyê bi tevayî, bi Kurd , Ereb, Asûr û Ermenên xwe ve, bi koçkiririna wî xemgîn bûn.



Rewşenbîr û hunarmend, siyasetmedar û civaknas li seranserî welêt û li derve, li berdewamiya 40 rojî hedanî nekete pel, pênuş û malperan, bi xemgînî û hestên şikestî bersiva xatirxwestina dawî ji welatparêz û hezkerê mirovatîyê BAVÊ ŞIYAR didan. Ji wê dema ku SÎPAN ê min, biçûkê xwişk û biran, hawar û gaziya xwe gihande min, ez pepûk û rebenê Xwedê, per û baskên min şikestine, tevzînok û tayên sar û gerim ez girtime, temara mirinê ketiye çavên min. Heyyyyyy hey mirina parsûxwar a bêbext û bê oool, heyyy feleka bextreş û xapînok we xwe li me kir yek û vê carê we li serî da, erêêêê aniha ez bêçek im, bêhêz im, baskên min şikestî ne!!.

Bûyer pir mezin e, ji min û pel û pênuşê mestir e, pişta çiyayê Cûdî pişta di bin bar de xwîz dibe, mesîl û newalên Dicle û Ferêt têra histêrên çavên min nakin!..Lê ez SIPANê xwe bi tenê nahêlim, ezê vê pênuşa xwe ya çavreş di gurçika mirinê de biçikînim, xencer û ekfiya xwe ya kurmançî di kezeba feleka rûreş de biçikînim.. Ez çi bikim, ji berê ve gotine mûma geş zû vedimire û temenê gula ciwan jî kurt e. Pend û banga te ji gelê te re

hertim ev bû: *"Eger hûn dixwazin dilê min di gorê de vehese û hêsa be, ji hev hez bikin rêzên xwe bikin yek, dest û milên xwe bidin hev û bi heşmendî ji bo doza xwe ya dadmend û rewa kar û xebatê bikin"*.

Rihet be serokê min, bila baweriya te bi gel û hevalên te bilind be ku ewê ra dawiyê rêça te bişopînin, ew jî mîna te wê hemî şêweyên kar û xebata aştiyane bi kar bînin û ji bo parastina nasnameya gelê xwe, wê qehremanî, disozî û welatparêziya te ji xwe re bikin nimûne û pirtûkeke pîroz, da ku rê li pêşiya wan dîz û ronî bike.

Li vê jînê, gelek zindî bê rewan in, lê çendekê nemiran hîn serkêş in, bi kerwan in.

Tucarî tu ji dil dernakevî, her û her tu serok û rêberê minî. Xweska ez karibim te di bin zimanê xwe de bimeyînim. Xweska ez karibim te di landika zarokên Helebçe de bi lorînim. Xweska ez karibim te di reşikên çavên xwe de veşêrim, da ku bi mijangên çavan te ji germ û seqema xuristê biparêzim ey heval. Lê,tenê ez karim eniya xwe li ber bejna te ta bi kabokan bitewînim.

Serokê min. Min nizanîbû ezê ewqasî bêriya goristana gundê Qereqoya xopan bikim, lê her êvara pêncşembê, çavnêriya min bike ez bêm serdana gora te, hêdî hêdî, bi nazikî wan kêstekê dora gora te biguvêşim ta dengê nalîna dilê min û ahîna kesrên bêrikirinê bên guhên te, tu xwe bi wan mijûl bike ta pêncşembeke din ezê bêm.

Serokê min bera hemî gulên vî welatî ji bo te bikin dîlan, tenê gulek ji rengê xwîna te bibe bawername, da ku di rojên pîroz, rojên cejn û şahiyên de, keç û xortên me gerdenên xwe pê bixemilînin, û heger rojekê buhar bi ser welatê me de bê, emê rahêjin gurzên gulên bên ser gora te û tev bi hev re sirûda azadiyê di guhê te de bixwînin û bistirên.

Rihet be serokê min, qehremanî, dilsozî, mirovatî û welatparêzî tev bi navê te dest pê dike. Tu payebilind hatî jiyane û payebilind û bi rûmet te jê barkir!!.

Cihê te buhuşta rengîn be, mêvanê Berzanî Qazî, Zaza û Şêxseîd be.